# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (171):

## Bajaroka "Kaxrê", jinek piştî salekê û du heyvan ji girtinê hişê xwe wenda dike, ji sê salan ve girtinên bêsûcane û veşartiyên zorane, bêserûberî û pevçûn










Ji bilî revandin û girtinên tewşankî yên ku Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî - Elceyş Elwetenî Elsûrî" ya bi ser Anqerê ve, ji bêtirî sê salan ve, di dermafê xelkê Efrînê de dikin; Istîxbaratên Turkiyê jî bi rengekî yekser serpereştiya cîbicîkirina girtinên bêsûcane - ne xeme ku di dermafê heman kesî de were dubarekirin jî- dikin, bi riya alavên xwe "dadgehên wêneyî û Asayêşa Sivîl û Leşkerî" yên ku li herêmê piştî dagîrkirinê çêkirine re, bi sedemên herî nizim ji têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re yan berevaniya di ber Doza Kurdî de yan jî tewanbariyên çêkirî, û bingehên daxuyaniyên kesayetî li ser girtiyan çêdikin û wan bi hepis û baceyan seza dikin, û hinan vediguhêzin Turkiyê, dora duhezarî bi demên dirêj zorane veşartine, û ta niha çarenûsa bisedan ji wan ne diyar e; Lê, piraniya yên hatine berdan jî ji ber kêşeyên tenduristiyê û dûhatên bieş li ser jiyana wan a civakî dinalin .

Vaye li jêr hin binpêkirin û tewanên ku bi şêwakî rêbazkirî pêkahatine ne:

**= B. "Kaxrê":**

Bi Navça Mabeta ve girêdayî ye, /10/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /400/mal pêkhatî ye, dora/2200/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, jê /125malbat=400nişte/ piştî koçberkirina zorane ji piraniya re lê man, û /225malbat=1200nişte/ ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Di dema şer de, bi sedema topebaranê hejmarek ji malan bi piçekî ziyan gihîştinê, û hin ji sivîlan şehîd û birîndar bûn, jê herdu pakrewan "Ciwan Sadêq Ezet Reşîd/42/sal li 2.3.2018an Z, Es'ed Ezet Ebdîn Mistefa/54/sal li 6.3.2018an Z", û termên wan li Goristana "Şehîd Avêsta" - Keferşîl li Efrînê (a ku piştî dagîrkirina bajêr ji holê hatiye rakirin) hatin veşartin.

Dema bajarok hat talankirin, Milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah" a ku "Mihemed Elcasêm - Ebû Emşe" serkêşiya wê dike, dest danîn ser dora /260/malî tevî kelûpel û heyînên tê de, û ji malên din hin firaxên baqirî, alav û amûrên elektirîkê, cerên gazê û hin tiştên din dizîn, û herweha jî heyînên herdu dibîstanên seretayî û amedeyî, heyînên xala bijîşkiyê ya Heyva Sor (dermankiringeh, bijîşkxaneya diran û jinan û giştî, nasînxaneke nexweşiyan û dermanxanek) ta asta ku ew xal ji xizmetguzariyê derket, /4/otombîl ên "Mihemed Oso kurê Mihemed, Selah Hacî kurê Mistefê, Mistefa kurê Besê, Fehmî Ebo kurê Elî", /6/tirektorên çandiniyê yên "Ferzat Zêno kurê Menên, Elî Heso kurê Hesen, Ebid Elkerîm Qasêm kurê Arif, Xelîl Ebdî kurê Ebdîn, Welîd Ebdî kurê Ebdîn, Mihemed Xoce kurê Hesen", amûrên navenda entirnêtê ya "Mazên Êmo kurê Mehmûd", giropeke zayenda elektirîkê (ampêr) ye mezin e xelkê bajarokê, /4/giropên zayenda elektirîkê yên malan ên "Elî Şêxo Ebo, Şêx Mihemd Ebo, Behcet Ebdî kurê Ebdîn, Idrîs Elî Ebo", patozeke lêxistina gênim û ceh û HWD e "Ehmed Silêman Mihemed", hemî acetên guvêşgeha zeytûna ya "Fayêq Mistefa Mistefa" tevî jêstandina tibabeke diravî mezin bi sozê vegerandinê, û tevhiya acetên guvêşgeha zeytûna tevî otombîleke baran e "Ebdo Xelîl Heso", û dest danîn ser avahiyên herdu guvêşgehan; Û herweha jî, dizîna guhêzok(trans) û keblên (Kabl)toreya elektirîkê ya giştî, kebil û heyînên tore û yekîneya roniyê yên telîfona zemînî û beşek ji stûnên darî, amûrên bircê hevgîhanên "Sêryetêl", û hemî jimêrokên ava malan ta asta ku toreya ava vexwarinê ji kar derket û niha bi sîtêran av tê peydakirin.

Û milîseyan malên "Mistefa Ebid Elrehman Hemo, Welîd Silêman Heso, Mihemed Şêxo Menan Êmo, Mihemed Mihemed Ebo, Ehmed Mihemed Hebo, Welîd Cabo, Şêxo Qasêm, Şukrî Ebdo Qasêm, Xelîl Seydo Henan" ji xwe re kirin biryargeh û niştexane ji endaman re, û herweha avahiya "Heyva Sor" jî kirin hepis û bargeheke leşkerî.

Û weha jî dest danîn ser piraniya malmewalên koçberên zorane, jê darên zeytûnê, gûzê û meywan (/1000/ ê "Mihemed Nûrî Xelîl", /400/ ê "Şêx Mihemed Ebo", /1000/ ê "Behcet Ebdîn", /200/ê "Deyan Êmo", /600/ ê "Mehmûd Weqas", /700/ ê "Fehîm Weqas", /700/ ê "Menan Weqas", /2000/ ê "Mihemed Celal Ebo", /300/ ê "Mihemed Şêxo Henan", /1500/ ê van hevbiran"Qaziqlî, Mistefa, Ehmed û Mihemed Silêman Mihemed", /250/ ê "Mihemed Heso", /400/ ê "Mihemed Şêx Hemîd", /1500/ ê "Şukrî Şêxo Qasêm û birayên wî", /600/ jî yê "Welîd Silêman Heso"); Bi ser de jî 40% li ser berhema werzên zeytûna yên hemwelatiyên ne li gund û /10-15/% li ser yên hene weke vêrgî sepandin, li rex vêrgiyên ku li ser werzên Simaq, Gûz û meywan hatine ferzkirin.

Û daristanên Çiyayên "Îso, Eşkê, Fato, Îbkê, Ne'iso, Kera, Reşok, Henên, Êmo, Hecî, Hêra" yên ihracê yên xwezayî bi rengekî nêzîk tevahiyê qut kirin, û bi hezaran jî darên zeytûnê û meywan bi awakî bêwijdan, ji bo êzingkirin û bazirganiyê; Bi ser de jî, çêrandina keriyên pêz bêwijdan di nav zeviyên çandiniyê de, da ku ziyanin mezin bighêje wan. Weha jî Artêşa Turkiyê bi armanca damezrandina bargeheke leşkerî ji xwe re, dora du hezar darên zeytûnê li Cîgeha "Sirta" - Başûrê bajarokê hilkir.

Weha jî milîseyan ji du salan ve Cîgeha "Bîra Gir - Til" ya şûnewarî kolan û tevdan, ji bo lêgerîna li entîkan û kinzên binerd ên veşartî û dizîna wan, û gorên bajarokê yên ku bi Zimanê Kurdî li ser hatine nivîsandin jî hilweşandin.

Û xelkê bajarokê yên mane jî rastî rengereng binpêkirin û tewanan hatin, mîna revandin û girtinên tewşankî û vêre jî işkencekirina mekin, kêmrûmetkirin û perestandin û hin tiştên din, û ta niha çarenûsa "Riyad Arêf Cabo/45/sal, Isma'îl Ebdo Mihemed/22/sal" ên ku ji Avrêla 2018an Z ve girtî û veşartî ne, ne diyar e; Û Milîseyên "Silêman Şah" hemwelatî "Ebdo Arêf Ibrahîm /33/sal" li Avrêla 2018an Z revandin, û di bin işkencê de kuştin, bê ku termê wî radestî xwediyan bikin. Û bi behaneya şewtandina du otombîlên wan

bişev li bajarokê, li siba Çarşemê 27.1.2021an Z, milîseyên heman firqê bajarok dorpêç kirin, endamên xwe bi awakî pir belav kirin, paşê avêtin ser malan û xelk tirsandin, /16/hemwelatî girtin, û guhestin navenda Navça Şiyê, da ku mekin bêne işkencekirin û hin ji wan têkevin nav nivînan, û piştî çend rojan hatin berdan.

**= Hişwendakirina jinekê piştî girtinê:**

Di raporeke wênekirî de, Cîgeha "Zeman Elwesil" ya iliktironî, li 26.10.2021an Z, perçevîdiyoyek li ser rewşa jineke bi navê "Zelîxe" belav kir, tê de tê gotin ku ew ji sê heyvan ve li ser bana avahiyeke Bajarê Efrînê dijî, nexweş e û bi nav hev xistiye, tu kes tune ye lê xwedî derkeve, ji bermayên gilgemarê dixwe, û bi hewcî hewandinê û dermankirinê ye; Û berê jî jiyaneke asa û xwezayî dijiya.

Piştî şopandinê û li gor hinde jêderên xwecihî, xuya bû ku ya mişextbûyî "Zelîxe Welîd Umer /30/sal" ji xelkê Gundê "Rûta" - Navça Mabeta ye, li Taxa Eşrefiyê - B.Efrînê rûdinişt, li 7.6.2020an Z tevî malbata mêrê xwe (Osman Mecîd Ne'isan/65/sal û hevjîna wî Zêneb Ebdo/60/sal, û kurên wan "Cangîn/32/sal û hevjîna wî "Zelîxe" digel zaroka wê, Şiyar/30/sal, Mihemed/28/sal û hevjîna wî "Ceylan Hemalo" û zaroka wê ya şîrmij) bi tuhmetên çêkirî hate girtin, û hemî ji heman gundî ne; Paşê "Zêneb" li navîna Heyva Tîrmeha borî ji Hepsa Maratê - B.Efrînê hate berdan, û ew ji nexweşiyeke mekin di serî de dikêşî û tenduristiya wê jî çetin bû, lê "Zelîxe û Ceylan" di wê hepsê de man, û her çar mêr zorane veşartî û çarenûs ne diyar man.

Berî girtinê nexweşiya axriyê bi "Zelîxê" re hebû, û ji ber işkencekirinê û mercên sert di girtîgehê de, tenduristiya wê her çû bi şûn ve çû; Piştî ku hiş wenda kir, li navîna Tîrmeha borî hate berdan, û bê cî û tu kes lê seke, di rewşeke pir ne baş de mişext bû, û bi taybetî jî, ji ber ku Milîseyên "Artêşa Leşkerî li Efrînê" dest danîbûn ser malên malbatê li Taxa Eşrefiyê tevî kelûpelên wan, li dema girtina tevahiya endamên malbatê; Û divê were bîranîn ku çarenûsa zaroka "Zelîxê" jî ne diyar e.

**= Girtinên bêsûcane:**

**Destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Ji dora çel rojî ve, hemwelatî "Hêvîn Ehmed/36/sal", û piştî wê bi heftakê jî "Cîhan Mihemed Elî Qere Heso/35/sal" -herdu ji xelkê Gundê "Etmana" - N.Reco ne, ji aliyê "Artêşa Sivîl" ve, bi tewanbariya têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re (hînkirina Zimanê Kurdî û kar di navendeke hilbijartinê de), herdu birin Hepsa "Maratê" li B.Efrînê, û ji deh rojan ve "Cîhan" hate berdan, piştî ku ew bi /1500/ PT hate sepandin, û ta niha jî "Hêvîn" zorane bendkirî ye.

**-** Li 3.11.2021an Z, hemwelatî "Xebat Mislim Bekir/35/sal" ji xelkê Gundê "Kosa" - N.Reco, ji aliyê gerokeke "Asayêşa Leşkerî li Mari'ê" ve, bi tewanbariya têkeliyê bi (R.X) a berê re, û ta niha zorane bendkirî ye. Vêca destêwerdana "asayêşa Mari'ê" di rewşa herêmeke din de, hevrêzî û serpereştiya yekser a Istîxbaratên Turkiyê li ser girtinên bêsûcane ji hemwelatiyên Efrînê re, aşkere û tekez dike.

**-** Li 7.11.2021an Z, hemwelatî "Ednan Şêx Sadêq/35/sal - bavê du zarokan", ji xelkê Gundê "Maratê" - B.Efrînê, li dema ku wî li ser teksiya xwe ya giştiyane kar dikir û di Riya "Efrînê - Meydankê" re derbas dibû, û ta niha jî çarenûsa wî ne diyar e.

Û berê jî "Asayêşa - Asaya Rêzanî li Efrînê" tevî Milîseyên "Feyleq Elşam", li Şeva 3-4.11.2021an Z, bi otombîlên çekdarkirî êriş birin ser Gundê "Îska" - Şêrewa, şeş hemwelatî -di nav de jî jineke temenmezin- girtin, û merivên hin din ên daxwazkirî agahdar kirin ku divê xwe radest bikin an jî wê bav û birayên wan bigrin, vêca piştî sê rojan ew neçar bûn ku xwe radest bikin, ew jî ev in"Mihemed Hesen Îbo/34/sal, Mihemed Elî Beko/27/sal, Nebo Elî Elo/25/sal, Hesen Samî Bazo/23/sal", û divê bê zanîn ku "Ebdo Ehmed Elo/49/sal" ji aliyê Rêbenda "Turindê" ya çekdar ve hate girtin; Û ta niha hemî li Navenda Efrînê zorane bendkirî ne. Û ji bo têbîndariyê, di rapora me ya borî de, navê "Ednan Umer Îbo" û hejmara girtiyan /15/, bi şaşbûn daketibûn.

Û ta niha Milîseyên "Feyleq Elşam" hemwelatî "Hesen Şukrî Seydo/36/sal" ji xelkê G."Îska", ji 16.11.2018an Z ve, di hepsa xwe ya taybet di avahiya "tîmargeha mirîşkan a dilovanber Farûq Ezet Mistefa" de, bê dadgeh an girtina parêzerekî zorane bend dike, û ew bi nexweşiyê gurçikê ye, li vê dawiyê jî di hepsê de bi Veyrûsa Korona ketiye, û metirsî li ser jiyana wî heye.

**= Bêserûberî û serberdayetî:**

**-** Li 8.11.2021an Z, di encama hevrikiya li ser çarçewa bandorbûn û dizînê, pevçûnin bi çekên cûrbecûr di nav bermayên Milîseyên "Lîwa'i Elxab" yên ku "Ela'i Elcinêd" serkêşiya wê dike û giropeke Milîseyên "Firqit Elhemzat" de, li Gundê "Çolaqa" - Navça Cindirêsê derketin, û di dû re di nav herdu aliyan de, li ser riya "Çûnûhata Rojava" û li nêzîk biryargeha "Elhemzat" di avahiya "Asayêşa berê" de - Ihraca Mehmûdiyê li B.Efrînê pevcûnin din çêbûn, bûn sedema metirsiyê di nav sivîlan de, û alavine ragîhandinê yen xwecihî yen rikber wêneyine "Mehmûd Elehmed" belav kirin, ku ew endamekî "Lîwa'i Elxab" e û li ser destê endamên "Elhemzat" di bin işkenceyeke mekin de hatiye kuştin.

Û dîsa li 11.11.2021an Z, li nêzîk derbasgeha Cindirêsê li B.Efrînê, di nav herdu aliyan de pevçûnina rûdan.

**-** Li 10.11.2021an Z, li Taxa Mehmûdiyê li Efrînê, giropeke ji çekdarên "Ehrar Elşerqiyê", li ber çavên endamên malbatê, bi sedema nelihevkirina li ser maleke desteserkirî, li temenmezinekî anînde ji "Elresten" - Humsê xistin, û di encamê de, li taxê xireciriyek di nav milîseyan û anîndeyên "Restenê" de çêbû.

**-** Li Şeva Pêncşemê 11.11 2021an Z, li hundir Bajaroka "Meydankê" - N.Şera, bi sedema hevrikiya li ser dizînan, di nav du giropên Milîseyên "Feyleq Elşam" de, pevçûnina rûdan, bûn sedema metirsiyê di nav sivîlan de.

**-** Weke tekezî ji dijberîkirina berdewam ji daristanan re, "Berevaniya Sivîl li Efrînê - Eldîfa'i Elmedenî" got: Ku tîmên wê, li roja Înê 12.11.2021an Z, agirek bi daristaneke ihracê li Bajaroka Kefirsefrê - N.Cindirêsê ketibû vemirandin, û rûberiya wê donimek erd bû.

Dozên girtiyên Efrînê yên kambax -bi taybetî jin jê- ji aliyê alavên ragîhandinê, rêxistinên mafewerî û sivîl û Dezgehên Netewên Yekgirtî yên têkildar ve, bi hewcî guhdaneke fere û karekî berpirsiyar e, da ku fişar li ser Turkiyê were kirin, ji bo bidawîkirina wan û seknandina binpêkirinên li dijî mafên mirovan.

14.11.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**
- Herdu pakrewan "Ciwan Sadêq Ezet Reşîd, Es'ed Ezet Ebdîn Mistefa".
- Kolandin û tevdana cîgeha "Bîra Gir - Til" a şûnewarî - B. "Kaxrê" - N.Mabeta, Zivistana 2020an Z.
- Herdu girtiyên zorane veşartî "Riyad Arêf Cabo, Isma'îl Ebdo Mihemed" ji B."Kaxrê" - N.Mabeta.
- Pakrewan "Ebdo Arêf Ibrahîm".
- "Zelîxe Welîd Umer" ya mişextbûyî (bêcîwarbûyî).
- Bendkiriyê zorane ji sê salan ve "Hesen Şukrî Sîdo" - G."Îska" - Şêrewa.
- Şewatek li daristaneke ihracê li nêzîk B."Kefirsefrê" - N.Cindirêsê, 12.11.2021an Z.